# Şîroveyên ji bo dê û bavên zarokan yên kû pirzimanî mezin dibin

Hemû ziman bi qasî hevûdû hêja ne, ji ber ku li pişta wan de çand hene.
Ji ber vê yekê, divê ji hemû zimanan re rêz were girtin.

Ji bo kû zarok zimanê xwe bi serfirazî fêr bibe, girînge kû

- Bi zarokê / a re **têkiliyek we ya baş** / bi zarokê / a re **eleqeya** we ya rastîn, hebe.
- Hûn **modelekê zimanî ya baş** bin (kîjan zimanê / zimanên kû hûn çêtir diaxifin, bi vê biaxifin).
- Hûn **pir biaxifin** (ji bo zarokê / a xwe pêşnîyarên gelek û cûdahî yên zimanê yên cihêreng bikêr bikin). Ji her tiştî çêtirîn: lîstin, xwendina bi dengekî bilind, vegotina çîrokan, stranan, zûgotin, lîstikên kû tên guhdarî kirin, derketina derve, serdana kesên din.
- Wê /wî **fêr nekin**, tenê di derbasbûnê de rast dubare bikin.

Girînge kû mirov ji bo fêrbûna zimanên din bizanibe kû,

- Pêwîste kû **zimanê yekem pir baş** were fêr bûyîn (domdarî bi qasî 5 salan)
- Fêrbûna **çend zimanan di heman demê de, pêkan** e.
- Tiştekê wekî **rêbaza bêkêmasî tune** ye.
- Fêrbûna yek zimanekê duyemîn bi teşwîqekê baş û gelek pratîk bi qasî 3 salan didome.
- Divê hûn ne li bende bin kû zarokê / a we bêkêmasî duzimanî- an ji pirzimanî be.
- Yek tevlihevkirina zimanan normal e, her weha tevlihev kirina mê û nêr, artîkel û ava kirina hevokan.
- Divê nivîsandin jî bi kûrahî were fêr bûyîn ( wek mînak bi alîkarîya HSU, https://www.dortmund.de/de/leben_in_dortmund/bildungwissenschaft/schule/herkunftssprachlicher_unterricht/index.html)
- Pêdivî ye kû hûn bi **rexneyî li medyayê** mêze bikin (heya 3 salan TV , têlefona desta, PC tune; modela rola zimanê zindî pir çêtir e, lîstikên kû tên guhdarî kirin, baş in)

Ferî zarokê / a xwe bikin kû **elmanî bi qasî** zimanê zikmakî û malbatî girîng e.

Feydeyên pirzimaniyê pir caran ew in:

- behreyên sosyo-hestyarî yên bilind (bi tiştên din va bi hevra dilovanî jî tê de)
- rêveberiya çêtir ya pevçûnê
- yek kapasîteya mezintir ya bîrê
- yek bala baştir kirin
- yek hêsantir hînbûna zimanên din
- ezmûnên çandî yên mezintir
- bêtir mecalên dîtina hevkarên sohbetê
- derfetên mezintir yêr karê

"Tu bi çend zimanan biaxî,
tu ew qas însan î "

(Johann Wolfgang Goethe,
helbestvanê Alman)